# SЬNƏTA ŞЬKЬLDARIJE NAVA XƏVATCIJE KYRMANÇADA.



Şьkьldar M. Harutunjan

## Sər rja şьkьldarije

Sьvə bu; sьat 6, caxe ky pənçe tóve kətьn sər cija u banja. Gynd nav pənçe roje zərьqin. Gynde kyrmança bu, gyndəki təzə. Əw bь dəsti Hykymətа Şewre hatьbu cekьrьne. Gyndda bьlьnd buvun avaje təzə.

Əz neziki gynd bum. Gyndda məktəb həbu, ƶь we hnəki dur avaje kolxoze bu.

Bь zərьqandьna təveva şajikə əşq kətьbu gynd; kyr u qiza dьstra, hər dərа əşq bu, hər dərа xəvat.

Mьn dəst pe kьr şьkl kьşand, mьn dəst pe kьr ƶь kona, əwana durva xyja dkьrьn.

Wəxte xəvate zar dora mьn çьvjan, wana nədьhişt əz rьhət bxəvьtьm, wana dgot: „Şьkle mə ƶi bьkşinə".

Le neta mьn əw bu, wəki əz şьkle gynd bьkşinьm, ómre təzə, wəki le nherandьne şunda, mərьv karьbə fəhm bьkə ómr u ƶijine kyrmançe xəvatci, alije sijasətije u həbuneda.

Mьn fьkr kьr ky zare gynd bь məktəbera bьdьm gredan. Mьn şьkl bьşandьn hьşt, əz cumə məktəbe. Zar ƶi paj mьn dьhatьn. Mьn zar jakə jako anin bər təxtə, təbəşur (kьls կավիճ) da dəste wan u əw hini şьkl bьşandьne kьr. Əwana bь əşq u dьl əw xəvat qədand Ƶь we jəke şunda zar hərro dьcun məktəbe. Əwana hini məktəbe bun, ədi nədxyəstьn ƶь məktəbe dərеn.

Wəxte şьkl kьşandьne xəvatcija nişani həv dikьr, cka əz kiƶan

şьkli dьkşinьm. Əz nas bum u mьn dit, wəki əwana, gələk fərasətьn u ƶь şьkl krьne fəhm dkьn.

Rastə hətta iro ƶi nav wanda sьnəte şьkьlije əwqa nəhatije xəvate, le disa əwana xəvata sьnətija şьkl hьz dьkьn, ƶe fəhm dkьrьn u dxyəstьn hini we sьnəte bьvьn.

Əz qədərа dy həvtja nav kyrmançe xəvatcida mam. Təşkilətеd gynda, xəvatcije aktiv koməkəkə baş nişani mьn dan. Neta ky əz pe cubum ƶь mьra mlasər bu.

Vəgərandьne mьn epeçə wəxt fьkr dkьr, wəki cьqa gyhastьn kətijə nav ómre xəvatcije kyrmança bь sijasəta fьrqa Lenin.

H. Çьndi.

## Şьkьle həv. Harutunjan u lazьmdarja şьkьlzana

Iro'dь gazeta „Rja Təzə" da tenə nəşьre şьkьle həv. Harutunjan.

Həvale Harutunjan şьkьldarəki çahьlə, hinbujə dь instituta şkьleja—Moskvaeda. Əwi ve gave net u mərəmə xyə danjə sər şьkьlkьşandьna hal u wəxte xəvatcie kyrmança.

Şьkьle wi iroin dərəq hal — wəxte xəvatclanьn, dərəq zəmane bəre u kьrna iroin əw xəvьtjə tomarja rabunrunьştьna xəvatcie kyrmançada bьdə. Əwi tomarja fьkre dajə, le dьdərəça konkrətjeda şьkьldari sər rast awqa ƶi nəbujə. Bəsa xəbərе: şьkьle ƶьna nə bь wi təbərinə cawa hənə, forme wana pьr hьndьki neziki həjata xəvatcie fьla dьvьn. Le bь wera təvaji əwi karbujə neta tomərla həjata gynd bь şьklava bьdə.

Əm ve təqminenə, ky xyənədkare mə we fьkьra xyə beƶьn də. rəq wan şьklada.

Pьrsa dьne iroin əwə, ky mə şьkьldar zóf lazьmьn. Dərsdar u şagьrtava ójanə, wəki cawa kteve mə dərten, şьkьle wana zóf çara nə ƶь ómьr u rabьn-runьştьna xəvatcie kyrmançanə.

Əva ƶь tynəbuna şьkьlzane həjata kyrmançanə.

Əm we netenə, ky wəxtəki kьnda Komisarjata Ronkaja Fьlьstane we şьxyləki bьkə dərəq ve jəkeda u sər we jəke ƶi we bьdьn haƶьrkьrne kadre şьkьlcia ƶь bona xəvatcie kyrmança u je minani həvale Harutunjan gredə bь xəvata mə təzə dəst pekьrira.

Wəxtə u lazьmə hazьrkьrna kadre şьkьldar.

Çərdo.

## Snhəte şkьlcitije u fərzija we

Nav xəbatcije kyrmançada kь şandьna şkla, (sьfəta), ƶь rumət kətьbu ysa, cəwak xyəndьn u nvisar. Mьvtəxyra cəwa peşija xyəndьn u nvisare gьrtьbun, ysa ƶi peşija şkьl kşandьne grtьbun. Wana gynə u wəbal həsav dkьr şkьl kşandьni, le ь çəm wan bylmiş dьbun hər şьkьl. (Sfət) Nəjnəsija ve dərəçe siasətije həbu ysa cəwa ja əylm u xyəndьne, cьmak bь şex, pir u məlla ójan bu, wəki xəbatcije kyrmanç bxunə we ƶ dьnijae hərtьşti zanbə, cóve wi we be vəkьrьn, we zanbə wəki bьn kylke şexl qьreƶ u xyjidanda tьşt tynə, peştьri dərəw u xapandьne. Ysa ƶi bь van mьvtəxyra ójanbu wəki roƶək zu u dərəng mьvtəxyrija wan sosrəti u cong daline wan we bvьn şьkьl, əwƶi şkьle óçevije u ь bər cóve hər xəbatci bgьrьn ysa, cəwa wə dit kinoja „Zəre"-da sosrətije şex u ƶьnka nəxyəndi. Loma ƶi van zurije xunmьƶ kьşьndьna şkl u sfəja kьrьbu qədəxə, pьr wəbal.

Inglaba Ok.tabьre ƶь məjdane dərxьst, zylmdar u zylma wan,



## Əmre koçərije

Bəri inglaba Oktjabьre u Nojabьre kyrmanç bь qalnaja xyəbá dьsitьn dь hale koçərijeda. Sal 12-ə məh, havine xyə dьdan quntare cija, paize u ƶьvьstane dadьkətьn dəşta. Bьnga wanə mqimi tynəbu. Əmre wa cьqas beƶi ь xəbatcije kyrmança dkьr tari-tərьstan, gələk çara ƶь vi əmri cedbu, talan u taƶan, merkyştьni u nəpaki.



Supas bo Enstîtuya kurdî ya Parîsê



## Gynde kocəraji zьvьstane

Çiçina kyrmançe koçər zvstane dьhewьrьn gyņda, əw zi ţəne syr u sərme qalьnda, ţy candьn nədьkьrьn, lomazi pakі car kəvra danədanьn sər həv, cətьnije wan dьha pьr bun.

Pəji inglabera lь Zakavkaze, lь. Adьrbeçaņe, Gyrçьstane u Fьlьstane bь həzara male kyrmançe koçər zь ve zəliqətije aza bun, ştəndьn gynd u xyəlie bun xyəji bьngə, mal u həbun.

qəlaşt pərda dərəw u dyrutija wan.

Bь izьn u azajera ţəvaji zь xəbatcije kyzmançara ani əylm u xyəndьn bь əlifbae ţəzə, bь əmrəki safi u gəş.

Iro xəbatcije kyrmaņça lь hər çija u gynda fərьh bь zmane de dxunьn, dьxunьņ „Rja Ţəzə", bь xyəndьnezа ţəvaji dvinьn şkьle xəbata sotsialistije, je əmre xyə, je mьvtəxyrija şexa, pira u məla. Le ditьn ţəne bəs ninə, iro zь hər xəbatciki kyrmaņça, zь aktiv u dərsdarəki mə te xyəstьn, wəki nav massaeda fərьh u zəla şьrovəkьn ker ħatьnә şkьla, neţa wanə bədəwije u siasətije u bь hər təhri koməke bьdьn wan həvala, jek bь ryhe proletariatije lь sər xyə hianinə şьxyle şkьdari.



Gynde ţəzə, je hena Şewre.

Pəji inglabera, lь Fьlьtanije səba kyrmançe kocər çergə gyņde ţəzə hatьn cekьrьne bь texnika paşьn, bь radio u hər lazьmati.

Lь van gyņda xəbatcije kyrmaņça bь dьl u əşq təşkil kьrьnə kolxoz, gələki şanə u razi zь əmre xyəji iroin.

## Aktive mə



Zь sәre zorьn, 1. Ose Sьlemaņov, yzve şewra gynde Həko, xəvatcije dərbdar—aktiv. 2. Bozoje Bьşar, xəvatciki aktiv. 3. Sukoje Rьzgo xəvatcije gynd aktiv. 4. Əfəndi Sьlemanov, sədre şewra gyņde Həko, xəvatcije aktiv.

## Ţelefon Çamuşvaneda

Çamuşvana məzьn nava nəhija Aqbarane zь alije kulturaje u həbuņe rozbroz peşda dьcə. Həja nьha lь gyndda dərəça ţelefone tynnəbu. Le ņha ţelefoņ həjə, dxəvьtə. Əva bona gyndija peşdacujiņəkə məzьnə, jak gələk koməke we bьdə wana alije cujin—kətьne, kulturaje u ħəbuneda.

Mьqalədar **Hysejne Aħməd**



Supas bo Enstîtuya kurdî ya Parîsê

## ĶE CƏWA ŞYXYƏL QƏDAND

Dərhəq təşkilkьrьna gazeta „Rja Ţəzə« hərţьm mə dnvisi dь „Rja-Ţəzę"-dą u bь wera ţəvaji başqə-başqə nómə sər həvale aktivda vəredьkьr, wəki aktived mə gynda u bazara zь gazet u kultura xəbatcije kyrmança nəjen bьrin, aliki, alije dьn ə́jan dьkьr, wəki cьqasi aktived mə, bь dьleşi dьnherьn lь kultura xəvatcije kyrmança, lь cekьrьna xəbata sotsializme bь ómre ţəzə, cьqasi xəmdarьn səba qəwin təşkilkьrьna kolxoza, hьlanina nəxyədițije; u xəbata majin.

Nəmə u nvisara mə əm anin sər we fьkьre, wəki çergą aktived mə, səjdaje gynda, bь ţəhrəki cərme xyə xyəji dьkьn bь zar məva gьredajinə. xəbata wan bь ty tьşti naje bər lь cóv, be caxe dvə çvat, jan konforans, her jək zь wan bь həvt wərьsa naje zəvte, bь ţəxmina wan hər tьşti tyndyrьstə.

Əm hьlinьn izbatija u binьn orţe kemasije cənd həvala, jek gymanə lь sərə, jek nьkarьn zь çavdarije brəvьn. Bəre əwlьn zь nəhja Aqbarane həvale Həme Şəmo, Rostəme Colo, Máksim, Fəti, Səmənd, (zь Səngəre) Bajiloze Cacan, Dьro, Ķerop, u həvale majin jek səjdanə, u gələki peşьn. Əm hьlinьn kьrьn u xəbata wan, jək bь jek lь sər bьsəkьnьn.

Gazeta „Rja Ţəzə" hərţьm zь van həvalara nvisijə, le çab, zь wan nəstəndijə. Gьlije dyda ve axьrijá paşьnda lь 13-ə gynde kyrmançe Aqbaraneda, tiraza „Rja təzə", dəwsa 600-700 həzmari gьhiştьbu 55 həzmari. gyhdarija van həvala lap zь gazeta „Rja Ţəzə« hatьbu bьrin, cьmak zь wan həvala gələk hьla nə „Rja Ţəzə« dьstinьn, nəzi xyəndьn u nvisare kyrmançi zanьn, bь təxmina wan əva xəvata nə ja wanə, rьhətə sər van gьliara dərbaz bun. Le əm təxmin dьkьn, wəki zuba gərək van həvala gərək gьranila ve xəbate bdana sər ystyje xyə, wəki Həv. həv. Hame, Rostəm, Maksim Xano, Rajiloz, Səmənd, Fəti, Hagop, Dьro u Ķerop, caxek dərbazi gynda dььn, ve xəbate zi həsab bьkьn ņcьki xəbata xyə, izne ņədьn wəki nav 13 gyndada tiraza „Rja Ţəzə". nəje lь 55 həzmari hase nəbə.

Gəlo van həvala pьr hьndьki zhmət bьķьsşnda we havьl bьkьrana jane na, soz tynə, wəki van dərəçaqa, jek mə lь zor gotьn, havьla həvala pьr bu. Bósa xəbəre əm hьlinьn Çərçərise, məha tirme u ţəbaxe 210 male Çərçərise bь təşkiləte xyəba dьstəndьn 11 həzmar „Rja Ţəzə". Həvale Xano sədьre şewra dy gynda soz da wəki tiraza „Rja Ţəzə" bьgьhinə 200 həzmari, le ty havьl nəkьr, səri nəeşand.

Disa lь wi gyndi katьbe yzəka fьrqe həv Hakop Mxiţarijan nava shətəkeda pəre 54 həzmar „Rja Ţəzə" zь 6 məha nə kemtьr dani orte, təne səba se təşkiləta, gəlo həv. Xano dьl bьkьra əwizi karьbu əwqas xəbat dve dərəçeda bьkьra jane na, soz tynə wəki karьbu carţaq bьkьra əva xəvata, ysazi həvale mə lь zor gotьn.

Redaksija „Rja Ţəzə" çar dьn zi ve kьrьn u xəbate tinə bira ţəmamiia aktived gynde kyrmança, wəki ţəşkil kьrьná ve xəbate, bь pəvgьredana həsьni wəkə xun u goşt fərzə bь hər həvali.

Əm iro zь van həvala dyxazьn xyə çavdar naskьrьna ve xəvate. Əm dyxazьn çabe bь kьrьn u şyxyl, nə bь təne zar, cəwa hərçar.

Ç.

# PAJCITJA „RJA ŢƏZƏ" BONA MƏHA CЬRJA PEŞ DƏST PE BUJƏ, BLƏZЬN, XYƏ BЬNЬVISЬN.




### Qьrara pajcitja „Rja Ţəzə"

| | |
|---|---|
| Məhək | 30 kap. |
| Ɖy məh | 60 kap. |
| Se məh | 90 kap. |
| Şəş məh | 1 m 80 kap. |
| Sal ţəmam | 3 m 60 kap. |

## Zь bona məķţəbe Dəvəxьrabe kьţeb lazьmьn

Nəhija Kotajkeda, nava gynde kyrmənça Dəvəxrabeda məkţəb zь 1 e ilune hatijə vəkьrьn. Dərsdare məķţəbe həv. Iskəndəre Musa jə. Həval bь dьl u çəgər zь bo ķara məkţəbe dxəbьtə. Le həjf, əwi cь kьr u nəkьr kьţeb u programe dərsa wəxteda nəstənd. Şagьrt nьha be kьteb u be programьn. Lazьmə komәkdari.

Mьqalədar Karmen Polo.

## Zь alije rədaksia „Rja Ţəzə"

Pьrsa nəgьhiştьna kьteba lь nəhija u nə nəşrbuna programa dərsa bь zьmane kyrmançi hatijə dani bər Komisariata Rənkaja Fьlьstane u nəşirəte.

## Qize Çamuşvane zь məkţəbe gərək şunda nəminьn

Nəhlja Aqbaraneda, gynde Çamaşvana məzьn peşə. Hər sal zi qiz wəxteda cunə məkţəbe, zь məkţəbe şunda nəmanə. Le sala isalin gyndi wəxteda qize xyə nəşandьnə xyəndьne. Awa: Çiza Ə́tar Çəme hər sal dьcu, dxyənd; le isal nacə, naxunə. Qize dьne zi cóv danə Çəme u zь xyəndьna xyə şunda dminьn.

Lazьmə gydari. Gynəhkare şunda exьstьna qiza gazi bər çavdarije bkьn, ky qiz zь xyəndьna isalin para nəminьn.

Mьqalədar Agьr

## Telegram zь Aqbarane

Nəhija Aqbaraneda lь gynde kyrmança pajcitja gazeta „Rja Ţəzə" həja 25-e məha ilune gьhiştijə 303-a, səva məha cьrja peşьn mə stəndijə pajcitja 363-a hətta 1 məha kanune sala 1934-a te stəndьn 666 həzmar.

Ņьvisandьna pajcija bь gymrəhi peşda dьcə. Ysa zi pajcitja gazet u zurnaled majin. Áv.

## Rastkrьna fərz

Gazeta mə 44-adá, wəxte nəşrkrьne bьn maşineda hərf drьzьn təvi həv dьvьn. Maşinəci nive şəve okarə sərbəst rast kə, lóma zi qəwьminə əva şaşije han:

Ruje I-da şewrdarijat — gərək bbija Şewrdarije, Əzizbəogv — gərək bbija Əzizbegov.

Ruje II-da lozungeda — dьlə — gərək bbija dьle, kьl — kьr. Nav „Bistuşəş komunar" — ada çerga 15-ada — majə — həjə, — gərək bьbija majə, şewr hejə.

Ruje III-da bьn şьkle Zevinda — Zəvin, gərək bьbija Zevin u cənd şaşije dьne.

## Qytja nəma

Rəwan, texnikuma kyrmança — qəlam — zanəra: — mьqale tə bь nave „Ə́dəte kəvn" (dy həv), najen nəşre: najen xyəndьne, zь wana tьşt naje fóm kьrьne, navetəji rast zi nəhatijə nьvisandьne. Dərbazi idara „R. Ţ". bə.

Ņəhija Ţóline, gynde Gəlto həvale Ləzgije Səfora: — mьqala tə dərəq qədandьna planada mə zóf dərəng stənd.

Wəxte we bhyrti bu, ləma zi naje nəşre. Bьnьvisə məqale ţəzə.

Redaktore çavdar Ç. Gençо.



Supas bo Enstîtuya kurdî ya Parîsê